# Azadî ji bo Abdullah Öcalan

## Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk, û Mafê Heviyê




Campaign Committee - Freedom for Öcalan,
Political Solution to the Kurdish Question
August 2025
X: @Vigil4Ocalan
Youtube:@Vigil4Ocalan

Li sala 1999, rêberê gelê Kurd Abdullah Öcalan di encama komployeke navneteweyî de hat revandin û li zindana Imralî girtin. Tevî wê yekê, tevgera wî bê guhertin ji bo têkoşînên Kurdan ên ji bo otonomî û demokrasiya li Rojhilata Navîn stûna sereke bu. Teorîyên wî îlham didin tevgerên dinyayî yên azadiya jin, ekolojî û hevhebûnê.

Îro jî divê şertên guncav ji birêz Öcalan, kesayetê herî girîng ê pêvajoya heyî ya 'Aşitî û Civaka Demokratîk' û nûnerê heqîqî yê gelê Kurd, re werin afirandin, ji bo ku ew bi awayeke rasterast bikare tevlî pêvajoyê bibe, û di encamê de jî were berdan.

Ji aliyê proseyên hiqûqî ve jî divê teqez biryara Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrupayê (DMME) ya 2014'yan a derbarê "Mafê Hêviyê" were bicih anîn. Ango mafê birêz Öcalan were naskirin ji bo ku doza wî careke din were nirxandin, û dû re azadiya wî misoger bibe. Di Îlona 2025'an de wê Komîteya Wezîrên Konseya Ewrupayê vê dosyayê û nexwestina Tirkî ya bicih anîna biryarên DMME guftugo bike. Ev jî derfeteke girîng dide saziyên Ewrupayê ku helwesta xwe ya di derbarê vê mijarê de diyar bikin, û piştgirî bidin demokratîse kirina Tirkî. Biryarên dadgehê û mekanîsmayên pêkanîna wan ji berê ve hene. Îradeyeke siyasî êdî lazim e, ku bi kiryarên şênber ciddiyetîyeke ji bona siyasetên demokratîk nîşan dide.



Mafê hêviyê konsepteke ku di nava qanûnên navnetewî de dertê pêş û bi teybetî di nîqaşên derbarê mafê mirovan de roleke girîng dilîze. Ew maf herî zêde û di çerçeweya mijarên girtinên heta hetayî û dibetiya berdanê de tê naskirin. Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrupayê (DMME) avakerê wê konseptê ye. Di dosyayên wek 'Vinter û Yên Din li dijî Qraliyeta Yekbûyî' (2013) de, Dadgeh biryar dabû ku cezayên heta hetayî ku tê de ji mehkûman re îmkaniyet neyê dayîn ku dema wan a girtîbûnê were kêm kirin, an ew werin berdan, bi awayeke rasterast qedexeya êşkenceyê, muameleyên nemirovî yan yên biçûkxistinê, û ya ceza kirinê bi gelemper binpê dikin (Meqale 3 ya Konvensyona Ewrupa ya Mafên Mirovan). Bi wê biryarê dadgeh 'mafê hêviyê' anî holê û nas kir: ku hêvî ji mirovan



re hêmaneke girîng û destûrî ye, ku têkiliyeke giran bi konsepta hizûrê re heye. Bi heman şiklî li dozeke din, doza Dadger Power-Forde'yê, hatibu diyar kirin ku "bêparhiştina ji tecrubekirina hêviyê hêmaneke bingeh a mirovbûnê li wan qedexe dike û bi wî awayî kiryareke ya biçûkxistinê ye".

Her ku çiqes ew di nava peymanên mezin ên navnetewî de rasterast nayê anîn ziman, mafê hêviyê girêdayî hizûra esas a mirovan e, ku bixwe prensîbeke bingeh a peymanên wek Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirov (DGMM) û Lihevkirina Navnetewî ya derbarê Mafên Welatî û Siyasî (LNMWS). Eleqeta wê bi mafên din heye. Wek mînak:

- Mafê azadbûna ji muameleyên nemirov an biçûkxistinê (Madeya 3, DMME; Madeya 7, LNMWS)



- Mafê girtiyan ê sererastkirinê û ji nû ve vegerandina nava civakê
- Mafê jiyan û hizûra mirovan

Bi vî awayî, her çend di teorî û pratîka hiqûqî de hîn pêş dikeve jî, mafê hêviyê mecburiyeke exlaqî û hiqûqî ye ku rûmeta insanî di çarçoveya qanûna navneteweyî ya mafên mirovan de bi hêz dike. Di bingeha xwe de mafeke ji bo naskirin û qebûlkirinê ye: mafê ku mirov di çarçoveya qanûna mafên mirovan a Ewropî de were naskirin, û kapasîteya mirovekî jî were nas kirin ku bikare hingê guhertinê pêk bîne wexta hêvî wek şandeya dîtina pêşerojê derbikeve holê.

Di çarçoveya doza Abdullah Öcalan û pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de, naskirina 'mafê hêviyê' girîngî û wateyek bilind digre. Bi girtina Öcalan, dewleta Tirk û hevkarên wê hewl dan gelê Kurd û tevgera ku wî daye destpêkirin bêdeng bikin û bitepisînin. Ji ber vê yekê, naskirina 'mafê hêviyê' di vê çarçoveyê de, naskirina mafê gelekî ye ku bi rûmet bijî û dûrî muameleyên biçûkxistinê. Ew ne tenê ji bo takekesan, lê di heman demê de ji bo civakek demokratîk û cihêreng jî dibe hêvî û derfeta ji bo guhertinê; ne tenê ji bo naskirina takekesan, lê di heman demê de ji bo felsefeyek azadîyê û jiyana ku bikare çareseriyan ji bo gelek qeyranên herî acil ên serdema me pêşkêş bike.Ji ber vê yekê, ew hem pirsgirêkek qanûnî ye û hem jî pirsgirêkek demokrasî û aştiyê ye, ji ber ku azadiya Öcalan faktoreke sereke ye ji bo çareseriya siyasî û demokratîk a pirsa Kurd.

## 1998 — Öcalan ji Sûriyeyê derdikeve, di lêgerîna çareseriya siyasî ya pirsa Kurd de berê xwe dide Ewrupayê

- 10 Cotmeha 1998: Öcalan ji Sûriyê derbasî Ewropayê dibe. Pêşî diçe Yewnanistanê, li wir tevî ku ji aliyê rêveberiya Yewnanistanê ve hatiye vexwendin jî, têketina wî nayê qebûlkirin. Ji wir, paşê diçe Rûsya û çend welatên din ên Ewrûpayê, da ku muxateban bibîne ku bi wan re li ser çareseriyek siyasî ya pirsa Kurd bixebite.
- Mijdara 1998: Öcalan nêzîkî 6 hefteyan li Îtalyayê dimîne. Bi hezaran Kurd diçin Îtalyayê da ku piştgiriya xwe ji bo hewildanên wî yên ji bo dîtina çareseriyek siyasî ji bo pirsa Kurd nîşan bidin.



## 1999 – Girtin, Dadgehkirin û Cezayê Mirinê

- 15 Sibata 1999: Abdullah Öcalan di çarçoveya komployeke navneteweyî de li Nayrobiya Kenyayê ji aliyê hêzên îstîxbarata dewletên rojavayî ve hate girtin û şandin Girava Îmraliyê ya Tirkiyeyê.
- 16 Sibat: Gihîştina Îmraliyê, di bin tecrîdê de girtin.
- Bi mîlyonan Kurd li Kurdistanê û çar aliyên cîhanê ji bo şermezarkirina girtina Abdullah Öcalan dadikevin kolanan.
- 25 Sibat: Yekemîn hevdîtina wî ya bi parêzeran re - kurt û di bin şopandinê de.
- 2 Adar: Komîteya Pêşîlêgirtina Îşkenceyê ya Ewropayê (CPT) serdana xwe ya yekem lidar xist.
- 11 Adar: Yekem hevdîtina taybet bi şêwirmendên hiqûqî re.
- 31 Gulan: Rûniştina doza Îmraliyê li Dadgeha Ewlekariya Dewletê destpê kir.
- 29 Hezîran: Bi sûcê îxanet û cudaxwaziyê cezayê îdamê lê hat birîn
- Cotmeh: Du şandeyên "Aştî û Çareseriya Demokratîk", yek ji çiyayan (1'ê Cotmehê) û yek ji Ewropayê (29'ê Cotmehê) ji bo destpêkirina mûzakereyên aştiyê têne şandin Tirkiyeyê. Her çend di destpêkê de bi xêrhatinê hatin pêşwazîkirin jî, endamên her du koman di dawiyê de li Tirkiyeyê têne girtin û zindanîkirin.
- 25 Mijdar: Dadgeha Bilind a Tirkiyê cezayê pesend kir.
- 30 Mijdar: Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) ji Tirkiyeyê dixwaze ku cezayê îdamê pêk neyne.

## 2002 – Veguherandina bo Zindana Heta Hetayê

- 9 Tebax: Tirkiye di dema aştiyê de cezayê îdamê ji holê radike.
- 3 Cotmeh: Cezayê îdamê yê li ser Öcalan veguherî cezayê hetahetayî yê bê tehliyekirinê.

## 2003–2009 – Biryarên DMME'yê yên li ser darizandina neadil

- 2003: DMME biryar dide ku darizandina Öcalan ne adil bû — redkirina derfetên qanûnî, dadgerê leşkerî, dadgeh kirina bilez û bez. Binpêkirinên li gorî maddeyên 5 û 6 (darizandina adilane û azadî).
- 2004: Öcalan yekem "nivîsên parastinê" yên xwe, destnivîsek ji pênc cildan bi sernavê "Manîfesto ji bo Şaristaniya Demokratîk" parve dike, ku paradîgmayek nû li ser bingeha azadiya jinê, ekolojî û konfederalîzma demokratîk destnîşan dike.
- 12 Gulan 2005: Dadgeha Mezin a DMME'yê biryara 2003'an piştrast dike: binpêkirinên madeyên 3, 5 û 6; biryara dayina tazmînatê ji bo lêçûnên parêzeran dide (~ 120,000 €). Daxwaza Öcalan a ji bo ji nû ve darizandinê ji hêla dadgehên navxweyî (Enqere û dû re Stenbol) ve di nîvê sala 2006'an de tê redkirin. Konseya Ewropayê di Sibata 2007'an de çavdêriya cîbicîkirina biryarê girt.
- Heta Mijdara 2009: DMME'yê diyar kir ku ji ber tecrîda giran a li ser Öcalan muameleya nemirovane lê hatiye kirin. Piştî vê yekê, şert û merc hinekî baştir bûne.

## 2009-2011: Pêvajoya Osloyê

- 2009-2011: Bi armanca çareseriya siyasî ya demokratîk a ji pirsa Kurd re hevdîtin tên kirin. Ev muzakere bi sedema ku Öcalan wek rakirina "şertên têkoşîna siyasî ya demokratîk" ji aliyê hikûmeta Tirkiyeyê ve bi nav dike, di dawiyê de bi ser neketin.
- Cotmeh 2009: du heyetên aştiyê, yek ji Mexmûr û yek jî ji Qendîlê, berê xwe didin Tirkiyeyê da ku beşdarî pêvajoya mizakereya aştiyê bibin
- 2009: Kampnyaya nû ya bi dirûşmeya 'Êdî Bes e' bi piştgiriyeke mezin hat dest pê kirin
- Mijdar 2011: 42 parêzerên Öcalan bi tawanên girêdayî terorê hatin girtin.
- 25 Hezîran 2012: li pêşiya avahiya konseya Ewrûpayê nobeta bêdem a bi daxwaza azadiya Öcalan hat dest pê kirin. Ji havînê heta zivistanê, ew nobet heta îro her roj tê lidarxistin. Her hefte, komek ji Kurdên diasporayê ji cihên cuda tê tevlî dibe.



## 2012–2015 – Nîqaşên Aştiyê û Peywendiyên Sînordarkirî

- 2012: Li girtîgehan girevên birçîbûnê ji bo azadiya Abdullah Öcalan têne li dar xistin. Di Mijdara 2012'an de, Öcalan banga bi dawî anîna girevên birçîbûnê kir. Mehek piştî wê, hat zanîn ku gotûbêjên nû li ser pêvajoya aştiyê bi Ankarayê dest pê kirin.
- 19 July 2012: Şoreşa Rojava, ku ji ramanên Abdullah Öcalan ên li ser azadiya jinê û konfederalîzma demokratîk îlham digire, dest pê dike.
- 3 Çile 2013: Öcalan di çarçoveya pêvajoya aştiyê de bi siyasetmedarên Kurd (Ahmet Türk, Ayla Akat) re civiya. Ev hevdîtin heta 2015'an berdewam kirin.
- 2013: Öcalan derbasî avahiyek nûtir a girtîgeha li Îmraliyê hate kirin; tecrîd berdewam dike.
- 18 Adar 2014: DMME li ser berdewamkirina binpêkirinan: Maddeya 3 - cezayê hetahetayî bêyî efûyê cezayeke nemirovane an jî ya biçûkxistinê ye.
- 13 Sibat 2015: 10.3 milyon insan li çaraliyê cîhanê daxwaznameyek ji bo azadiya Öcalan îmza kirin. Di qonaxek berê ya vê kampanyayê de, 3.6 milyon kesên din daxwazname îmza kiribûn (bi vî awayî tevahîya îmzeyan gihîşt 13.9 milyon).
- 5 Nîsan 2015: Dewleta Tirkiyeyê pêvajoya aştiyê ji nişka ve bi dawî dike.

## 2016–2023 – Bisînorkirinên Hiqûqî û Tecrîd Dijwartir dibin

- 2016-2025: Çend bajarên Îtalyayê hemwelatiya rûmetê didin Öcalan, di nava wan: Napolî, Palermo, Reggio Emilia, Castel del Giudice Castelbottaccio, Fossalto, Berceto û Martano.
- 8 Mijdar 2018: Leyla Güven ji bo rakirina tecrîda li ser Öcalan dest bi gireva birçîbûnê dike; bi hezaran kes tevlî dibin.
- Destpêka 2019'an: Li girtîgehan û li ber Konseya Ewropayê ji bo azadiya Abdullah Öcalan greva birçîbûnê tê lidarxistin ku 200 roj dewam dike.





- Çile 2019: 50 Xelatgirên Nobelê nameyek îmze kirin bi daxwaza bidawîanîna tecrîda li ser Öcalan.
- 2019: Serdanên ji parêzer û malbatê ve ji nû ve dest pê dikin; serdana heştemîn a CPT di meha Gulanê de pêk hat.
- 2022 (Îlon): CPT serdana nehemîn pêk anî; Tirkiye eşkere kirina raporê red dike.
- 2021 (Adar) -2024 (Cotmeh): Öcalan 43 meh di girtîgehê de di bin tecrîdeke temamî de tê ragirtin.
- Cotmeha 2023: kampanyayeke nû ya bi dirûşmeya "Azadî ji bo Öcalan, Çareseriya Siyasî ji bo Pirsa Kurd" dest pê dike.
- Havîna 2024: 69 xwediyên Xelata Nobelê bi daxwaza bidawîanîna tecrîda giran a li ser Öcalan nameyek ji saziyên navneteweyî û ji serokkomarê Tirkiyeyê re îmze kirin û şandin.
- Tevî êrîşên dijwar jî, gerîlayên PKK'ê di parastina herêmên xwe de bi serkeftî li ber xwe didin û îzbat dikin ku bi rêbazên leşkerî nikarin werin tunekirin.






**Dawiya 2024 – 2025 – Têkiliyên Siyasî û Banga Bêçekkirinê**

- 23 Cotmeha 2024: Serdana yekem a malbatê piştî nêzîkî çar salan ji hêla parlamenter Omer Öcalan ve.
- 28 Kanûna 2024: Serdana şandeya Partiya DEM.
- 22 Çileya 2025: Serdana şandeyeke din a DEM'ê.
- 27 Sibata 2025: Serdana berfireh a şandeya DEM'ê û parêzer. Öcalan bi eşkere banga bêçekkirin û fesihkirina PKKê dike.

**Adar–Gulan 2025 – Bersiva PKK'ê & Agirbest**

- 1 Adara 2025: PKK'ê bi şertê azadiya Öcalan agirbestek bi merc û bêçekbûna di demên pêş de îlan dike.
- Gulan 12 2025: PKK bi fermî fesihbûna xwe îlan dike.

- Havîna 2025'an: 88 xwediyên Xelata Nobelê ji bo piştgirîdayina pêvajoya aştiyê û daxwaza azadiya Öcalan nameyek ji saziyên navneteweyî û serokkomarê Tirkiyeyê re îmza kirin û şandin.
- Tîrmeh 11 2025: Şewitandina sembolîk a çekan ji aliyê şervanên PKK'ê ve di bin çavdêriya navneteweyî de.

Abdullah Öcalan di girtîgehê de "Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk" a ji pênc cildan pêk tê nivîsand, ku tê de sosyolojiyeke nû ya azadiyê û paradîgmayek ji bo rêxistinbûna xweser a demokratîk a civakê li ser bingeha prensîbên azadiya jinê, ekolojiyê û neteweya demokratîk pêşniyar kir. Di çarçoveya pêvajoya nû ya ji bo 'Aştî û Civaka Demokratîk' de, Öcalan di pirtûkek nû ya bi navê "Manîfestoya ji bo Aştî û Civaka Demokratîk" de pêşniyarên nû ji bo avakirina "civakek demokratîk" bi rêya "siyaseta demokratîk" û "hiqûqeke hevgirtî" pêşkêş kir.



Di 27’ê Sibata 2025’an de, rêberê gelê Kurd Abdullah Öcalan bangek ji bo "Aştî û Civakeke Demokratîk" kir, ji bo çareserkirina pirsa Kurd a bi rêbazên siyasî û demokratîk. Ji bo vê armancê, wî banga danîna çekan kir, li ser bingeha naskirina siyaseta demokratîk û çarçoveyek qanûnî ku hemû beşdarvanan bikaribin bi hev re ji bo çareseriyê bixebitin. Öcalan pêşniyar dike ku "rêzgirtina ji bo nasnameyan, mafê xwe îfade kirina azad, û îmkaniyeta rêxistinkirina demokratîk - ku rê dide her beşeke civakê ku bi xwe şikil bide avahiyên xwe yên civakî-aborî û siyasî - tenê dikare bi hebûna civakek demokratîk û qadeke siyasî were



pêkanîn". Ev bang piştgiriyek berfireh a navneteweyî ji saziyên navneteweyî, di nav de Sekreterê Giştî yê NY, û her wiha partiyên siyasî, rêxistinên civaka sivîl û tevgerên civakî, wergirt.

Di mehên piştî vê bangê de, bi înîsyatîfa Birêz Öcalan û civaka Kurd gavên girîng ber bi çareserkirina pirsa Kurd ve hatine avêtin. Ji 5 heta 7'ê Gulanê, PKK'ê kongreya xwe li dar xist, ku di encamê de têkoşîna çekdarî hate bi dawî kirin, PKK hate fesîhkirin û têkoşîna ji bo demokrasiyê li Kurdistanê bi rêbazên siyasî berdewam tê meşandin. Di parlamentoya Tirkiyeyê de pêşniyar ji bo avakirina komîsyonek






parlamentoyê ya pir-alî ji bo çavdêriya pêvajoya demokratîkbûnê li Tirkiyeyê bi rêya çareserkirina pirsa Kurd, hate kirin. Bang ji hemû aliyên siyasî yên li Tirkiyeyê, û her wiha ji civaka navneteweyî û raya giştî ji bo piştgiriya vê pêvajoya nû hatine kirin. Weke mînak, gelek akademîsyen û rewşenbîran bi kampanyaya xwe ya piştgiriyê ya "Ez Dixwazim Biçim Serdana Öcalan" desteka xwe anîn ziman. Li Romayê, Stenbol, Amed, Bruksel û deverên din konferans hatine lidarxistin da ku li ser mijarê nîqaş were kirin û proje û çareseriyên gengaz werin pêşniyar kirin. Di Hezîranê de, 88 xwediyên Xelata Nobelê nameyek ji bo piştgirî dayîna pêvajoyê û daxwaza azadiya Abdullah Öcalan ji saziyên navneteweyî re şandin.



Lê belê, gavneavêtina hikûmeta Tirk fikaran ava dike, hem jî ji ber bêçalakiya wê di çarçoveya pêvajoya heyî de û her wiha ji ber nêzîkatiyên wê yên otorîter ên li hemberî civakê û berdewamkirina êrîşên leşkerî li dijî herêmên Kurdan.

Heta niha di warê naskirina mafên Birêz Öcalan de, di şert û mercên girtina wî de guhertinên berbiçav çênebûne. Sê girtiyên siyasî yên din ji bo ku bikaribin bi Birêz Öcalan re bixebitin ji bo girtîgeha girava Îmraliyê hatibûn veguhestin, lê dema ku dikarin bi hev re derbas bikin sînordar e.



Her çend di mehên dawî de destûr hatiye dayîn ku şandeyên siyasî serdana Birêz Öcalan bikin jî, serdanên parêzerên wî hîn jî qedexe ne. Di mehên dawî de ji bo cejnên olî du serdanên malbatî yên nefermî pêk hatin, lê mafê serdanên birêkûpêk bi endamên malbatê re û têkiliya bi rêya telefonê hîn jî sînordar e.



Divê rêbazên yasayî û siyasî ji bo çareserkirina pirsa Kurd werin afirandin. Ji bo ku Tirkiye demokratîk bibe, divê pirsa Kurd li ser bingeheke demokratîk çareser bike. Aştî tenê bi siyaseta demokratîk mimkun e. Rêberê gelê Kurd Abdullah Öcalan divê ji hêla fîzîkî ve azad bibe. Divê bikaribe bi awayekî çalak beşdarî siyasetê bibe; Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk koordîne bike û bi rê ve bibe.

Serkeftina vê pêvajoyê wê bandorên dûr û dirêj li ser tevahiya herêmê bike û rê li ber pêvajoyên wekhev ji bo aştî û xurtkirina civakên demokratîk veke. Li Rojhilata Navîn a ku şerên di navbera netew dewletan li ser hesabê gelên herêmê her ku diçe zêde dibin, israra li ser aştî û xwerêveberiya demokratîk ne tenê hewcedariyeke mezin e, lê di heman demê de "rêyek sêyemîn" temsîl dike ku çareserî ji bo gelek qeyranên heyî pêşkêş dike.

Beşdarbûna xurt a hemû beşên civakê, hem li herêmê û hem jî di asta navneteweyî de jî pêwîst e - Birêz Öcalan vê pêvajoya nû bê sebeb wekî pêvajoya "civaka demokratîk" bi nav nake. Ger pêvajo ji aliyê muxalefetê, rêxistinên civaka sivîl, jin, ciwan û hemû beşên civakê ve were pejirandin, em dikarin pêvajoyê ji rewşa bêçalak a siyaseta heyî ya hikûmetê derxînin û ber bi aştiyek rasteqîn û mayînde ve bibin.

Bi xurtkirina nirxên demokratîk, hêzên demokratîk ên di nav civakê de wê bikaribin bi awayekî çalak beşdarî pêvajoyê bibin: rêbazan nîqaş bikin û pêş bixin, rojevê destnîşan bikin û projeyan ji bo çareseriyên pratîkî pêşkêş bikin. Di vê çarçoveyê de em van daxwazan pêşkêş dikin:

1.Biryara Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê ya sala 2014'an a di doza Öcalan li dijî Tirkiyeyê de divê were bicîhanîn, bi taybetî di derbarê guhertinên qanûna Tirkiyeyê ya têkildarî mafê hêviyê, ku dibêje girtina heta hetayê bêyî îhtîmala berdanê qedexeya îşkence û muameleya xerab binpê dike.

2. Divê Tirkiye Birêz Abdullah Öcalan serbest berde. Azadiya fizîkî ya Birêz Öcalan, mîmarê vê pêvajoya aştiyê, ji bo çareserkirina Pirsa Kurd pir girîng e. Divê destûr bê dayîn ku ew beşdarî pêvajoyên siyasî bibe, bi parêzerên xwe, çapemeniyê, partîyên sîyasî û nûneran re, rêxistinên civaka sivîl û aktorên din re bi azadî danûstandinê bike.

3. Divê Meclîsa Mezin a Neteweyî ya Tirkiyeyê gavên siyasî û qanûnî yên berbiçav ên ji bo demokratîkbûnê û naskirina mafên Kurdan li Tirkiyeyê bavêje, da ku wekhevî di navbera hemû gelên welêt de pêş bikeve û were parastin.

4. Divê welatên endam ên YE û aktorên din ên navneteweyî Tirkiyeyê teşwîq bikin ku tavilê gavên berbiçav bavêje da ku bi rêkûpêk beşdarî vê pêvajoyê bibe, bi karanîna zexta dîplomatîk û pêşkêşkirina hewldanên navbeynkariyê ji bo ku were teqez kirin ku Tirkiye prensîbên demokratîk pêk bîne, êrişkariya leşkerî rawestîne û xwe bide ber pêvajoyek aştiyê ya pêbawer, berfireh, ku ji hêla navneteweyî ve tê piştgirî kirin.

5. Divê Tirkiye, welatên endam ên YE, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û welatên din ên peywendîdar PKK'ê ji lîsteya terorê derxin û dawî li krîmînalîzekirina neheq a Kurdan bînin. Ev yek wê rê li serkeftina pêvajoya nû veke.



